# TENBÛR

**Pênasa Tenbûra Kurdî-Zagorsî**

Her weku tê zanîn çiyayê Zagrosê hêlîna mirovahî û pirranî xelkên rojhilata navîn û beşek ji cîhanê bûye, bi dirêjahiya hezaran sal gelek hoz û komxelkên ji çiyayê Zagrosê daketin û warnişînên deşt û deran bûne. Lê hoz û komxelkên ku karîn bo cara yekem şaristanî, nivîs, zanist, hûner, mûzîk, gerdûnnasî, zagon, dastan û edebiyatê biafirînin Sumerî bûn. Xor yan jî roj û tav ji Zagrosê re bi dirêjahiya hezaran sal û heta digîje Sumeriyan, sembol û hêza pîrozweriyê bûye, piştre li ser heman bîr û baweriya kevnar bo cara yekem felsefe û bîrûbaweriyeke nû ava dibe bi navê Mêhr, Mêhra yan jî Mîtra anku bîrûbaweriya roj û ronahiyê, di ol yan jî bîrûbaweriya Mîtrayiyê de pîrozweriyên sereke weku: “Xor yan jî roj û tav, Cejna Newroz, Cejna Mêhr yan jî Yelda, Tenbûr, Hêkerengîne, Marê reş, Henar, Sêva Mêxekrêj, Gula Nîlûper(Nîlûfer)” yd..

Evne weku pîrozweriyên esasî yên Mîtrayî ji aliyê bakur û rojavayê gihişte derya navîn û Ewropayê, ji aliyê başur û rojhilatê jî gihişte derya aram û hîndistana kevin, çîn û japonê jî. Rêbaza û ayina Mîtrayî li her herêmekê bi awayekê dihate peyrewkirin, bi gelek cur û rengên cuda belav bû, lê sê olên ku ta niha jî mane û li ser rêça kevnar diçin karîn li ser heman kok û kod û pîrozweriyên Mîtrayî bi şêwazeke hinek cudatir şikil bidin û olên xwe biparêzin û peyrew bikin ku, ew jî “Yarsanî, Zerdeştî, Êdîzî” ne, her sê olan bi awayekî serbixwe ne lê di bingehê de her sê jî sê şaxên Mîtrayî ne û vedigerin ser bîrûbawerîya Mîtrayiyê.

**Pîrozweriyên Mîtrayî di olên hevolî de**:

Di Yarsaniyê de: “Xor, Newroz, Yelda û Tenbûr” şênberên bingehîn in.

Di Zerdeştiyê de : “Xor, Newroz, Yelda û Henar” şênberên bingehîn in.

Di Êzdîziyê de: “Xor, Hêke rengîne (çarşema Sor), Marê reş, şênberên bingehîn in. helbet ew her heft pîrozwerî û çendîn hebûnên din pîrozwer û sembolîze bûne lê carna bi nav û navnîşanên cuda cuda.



**Tenbûr di ola Yarsaniyê de**:

Di ola Yarsanî de Tenbûr bi awayeke kûr û hûr hê bi pîrozwerî û taybetiya xwe maye cihê xwe gitiye. Di cemxaneyan de weku zîkir, îrfanî û hestê ruhê tê jenîn. Bi taybet li Loristanê û Kirmaşanê layî, Qelxanê Sencabî, Kerendî Menşînan, Kelhûrî, Yarsanî û di her weşa “Şahxoşîn”ê de, Şahxoşîn yek ji rêberê mezin ê Yarsaniyan e û di dema xwe de koma Tenbûrjenî yên 900 kesî saz kiriye û ew bi xwe jî Tenbûrjen bûye, lew weku amûra Şahxoşînê jî tê binavkirin, her weha du cûr awazên wî hene

1.Neîrfanî.

2.Awaz-şîrra Nezimî Heqqanî ku 72 dane ne.

Lê di nav Qelxanî û Goranan de li Kerendê di şîna mirî naştinê de tê jenîn yan jî di dema sermirinê û rojên şînê de tê jenîn ên têne şînê jî dîsan ji dûr ve tenbûrê dijenin, heman merasîm her sal 3-7 rojan dîsan tê dubare kirin.




**Kurd û teîroze**:

Gelê Kurd ji ber gelek sedeman hata niha çand, hûner, dîrok û nirxên xwe teîroze nekiriye û dagirkariya hezaran salî ji aliyê gelên derdor ve, xencî dagirkariya niştimana Kurd û gelê Kurd, çi dîrok, çand, hûner û nirxên wî jî hene hemû weku xenîmeyên dagirkariyê hatiye talan kirin û ji aliyê gelên serdest ve hatiye temelûk kirin. Her ew sedem jî weha kiriye ku nikaribe dîroka xwe baş nas bike û jiyanboriya xwe analîze û organîze bike, lew eger em tenê behsa kevnarî û pîrozweriya Tenbûrê bikin, em fêm dikin ku Kurd di çi rewşeke kembax de ye li ser destê gelên serdest û dagirkarên niîtimana Kurdan.

**Di warê dîrokiyê de Tenbûr**:

Dîroka Tenbûrê gel peydabûna Mîtrayê heye û dîroka wê zêdetirî 5000 hezar salan e û dîroknasan şûna peydabûna wê bi taybetî vedigerînin herêma Îlamê li Rojhilatê Kurdistanê. Di warê arkolojiyê de temenê wê amûrê bi rêya peykereke helkolî şîkar, nêt û zelal dikin ku li hawira gorra hezretê “Daniyel” li herêma “Şûş”ê ku du mêr yek ji wan Tenbûrê dijene û dîroka wê vedigere 3 heta 4 hezar sal berê zayinê. Her weha dîtina peykera kevirîn a Tenbûrjenê

“Kîwî Kîwîn Cîk”ê li hawira bajarê Nînova (Musil)ê ku dîroka wê vedigere 5 heta 7 hezar sal berêzayinê. Lê hin lêkolerên Ereb wê amûrê vedigerînin serdema gelê “Lug”ê. Ji aliyekê din Îbin Xordad wê amûrê vedigerîne Kurdê Xorasanê weha dibîne ku taybet e bi Kurd û zimanê Kurdî. Her weha “Hilmeltez” dibêje: “Tenbûra Xorasanê bingeha mûzîka îranê ye û lew jêre dibêjin: bavê Tarê” hinên din weku dayika mûzîka îranê wê tînin zimên. Şitawder jî wê amûrê vedigerîne Xorî, Xûrî, Hûrî ku ji gelên Kurdên resen in, lê weku ereb di behsa tenbûrê de navê wê weku “ ‘Ûda garden dirêj”ê tînin zimên. Farabî di pirtûka “Mûzîka Mezda(الموسيقى الكبير)”ê de weku Tenbûra Xorasanî û Bexdadî navê wê tîne zimên. Di Ensklopîdiya Brîtaniyê de weha qala amûra Tenbûrê dike: “Amûra Tenbûrê yek ji amûra jêdar e ku 2 yan 3 jêyên wê hene û bi tilî û destan tê jenîn.

**Pêkhatên wê**:

Tenbûr yek ji amûrên herî kevn a Kurdî ye weku Def, Dehol, Çeng û Şimşal yd… Yek ji pîrozweriyên Mîtrayî Tenbûr û jenîna Tenbûrê ye weku zîkir û yarxwedayî. Tenbûr pêktê ji kaseyeke mezin a bazû dirêj e û çar tayên wê hene

*“Çar tay şênbera her çar tûxmên esasî yên gerdûnê ne ku fikir û felsefeya Mîtrayî li ser ew çar tûxmên esasî yên du cot pêk tê ku ewan jî “As(An), Ar, Av, Ax” in û du cotên “As(An) û Ar” Nêr & “Av û Ax” Mê ne”.*

Di warê pêkhatên wê de: Tenbûr

1.Boksa (koda deng / kodika deng) dengê “kaseya hêkî” ku ji sê taran mezintir e, stûrî 2-4 sm, dirêjî 37 sm.


2. Rûyê amûrê ku dibe pêşîya kaseya dengê 1.0 sm û ji dara Tûyê tê sazkirin.

3. Gerdena amûrê destika wê ji darên xurt ên gûz, hermî û qeysîyê tê sazkirin, lê baştirîn cûrên wê ji dar gûzên kevin e ku 59 sm dirêjiya wê ye û perde li ser wê têne rêzbendî kirin.


4. Çînebendî (perde) berê ji rûviyên ajalan dihat sazkirin lê niha ji madeya

naylonê tê sazkirin û hejmara wan 14-15 perdeyan e.
5. Jêyên wê, ber tayên avrîşmî dihat bikaranîn lê niha “Jêyên kanzayî” têne bikaranîn ku mewdayên wan 1 - 9 dibe.
6. Kîlît ji dara Pitûyê tê sazkirin ku kontrola nerm kirin û tund kirina denûzûyên jêyan dike.
7. Jêrgir ku ji kanza yan qoç yan jî plastîkê tê sazkirin û karê wê ragirtina jêyan e. Pird (xerek, kolek), du cûr pird hene yek li ser boksê û yê din di dawîna gerdena amûrê de ye ku pirda ser rû ji darên xurt tê sazkirin û pirda duyem ji qoç yan jî plastîkê tê sazkirin.

**Di warê deng de**:
Tenbûr çardeh hetanî panzdeh  perdeyên wê hene ku bi girêkek li ser boksa deng û kîlîtên wê tên bal hev û hejmara “jê”yên wê çar jê ne bi vê awayî “DO .DO .SÎMBOL _YA SOL * FA ._YA RÊ” Mewdaya dengê DOyê xwar û DOyê navîn destpê dike hetanî RÊyê Oktafîkê ya joriya DOyê navîn ku dibe du Oktafan,



lê jiber standar nebûna wê, lê li hin deveran guhertin bi ser wê de têne kirin.



**Navê wê**:

Navekî Kurdî – Zagrosî kevnar e û bi çendîn awayî navê wê hatiye gotin weku “Tenbûr, Tembûr, Tenbîr, Zaz, Saz, Bizriq, Bizoq, Bisoq” yd.. Gor lêkolînê hinekan Tenbûrê ji du beşên “Ten+Bûr”ê pê tê “ten” anku laş û benden “bûr” jî anku derbasbûn û çûyin ji laş û bendenê, bi wateyeke din Tenbûr ku yek ji pîrozweriya Mîtrayî û niha tenê di ola Yarsaniyan û Kurdên Dumbulî, Dimbilî, Dimilî, Zaza û Elewî”yê de ku di kok de her Yarsanî ne lê di dem û derên cuda û bi nav û navnîşanên cuda, bi heman pîrozweriya Mîtrayî maye, amûra zîkir û yarxwedayiyê ye û di dema jenîna wê ruh ji ten û benden dibûre û derdikeve û ruhê însan dibe cîhana ruhanî û dûr û yarxwedayî. Hinek din vedigerînin ser “Zenbûr”ê ku tê wateya “heng”ê, hinên din weku wateya “temere anku sext û dijwar” yan jî weku “Tembûr”ê ku navê derekî ye li bakurê Kurdistanê, hinek din wateya navê wê şîkar dikin û weku “Tel+Mûr”ê anku tela ku mûrê pê dikin. *“Mûr cûre awazeke di Kurdî de ji bo şînê tê xwendin”* anku awaz û jenîna ji bo şînê. Di hin jêderkên din de vedigerînin ser “ten-bûr”ê ya Yunaniyan ku tê wateya “dilkêşî, hestkêşî, dengê herî balkêş û xweş” yd.. Di Grove dictionary of music’ê de weku “Pandora, Pandola, Mandora, Mandoline” yd.. hatiye bikaranîn

**Çend cûrên din jî ji amûra Tenbûrê**:

1.Tenbûra Xorasaniyê

2.Tenbûra Bexdadiyê

3.Tenbûra Şêwraniyê

4.Tenbûra Azerî û Anatolî

5.Tenbûra DuTelî ji amûrên sertayî ye û li bakurê Afrîkayê

6.Nayê Tenbûre ku bi Kemanê tê jenîn

7.Tenbûra Marakeşiyê ku 7 tayên wê hene.

**Meqamên Tenbûrê**:

Meqamên Tenbûrê di Kurdî de tew “Şahxoşînî, Şeyx Emîrî, Seherî, Baba Kawisî, Abidînî, Cilewşahî, Fetah Paşayî, Çepî, Qetar, Helperkê û Terz” in.

**Tenbûr di Okestrayê de**:

Tenbûr li Rojhilatê Kurdistanê de weku xwe bo cara yekem di sala 1972an de ji cemxane û cîhana zîkir û îrfanê derdikeve li ser destê Emîrûllah ŞahÎbrahîmî dûre avakirina komeka mûzîk di sala 1974an de li ser destê heman mamoste û beşdarîkirina wan di “Festîvala Mûzîka Kurdî” de li hola Rûdekî yê, di wir de yekem mûzîka wan mûzîkeke îrfanî bû pêşkeş kirin, pêşkeşkirina vê parçe mûzîkê di qada okestrayê weku yekemîn tevgera hatinedera Tenbûrê ji boneyên Olî bo cîhana hûnerê tê hejmartin. Her weha mûzîkjen û tenbûrjenên weku Xûsrew PûrNazirî û SeydXelîl AlîNejad, Şehram Nazirî weku mezintirîn tenbûrjenên îrfanî ji hêla zanista tenbûrê ve têne hejmartin.

**Tenbûr û Tirk**:

Weku tê dizanîn tirk û çend komxelkên din kêmtir ji hezar sal in ji Asya Navîn hatine deverên Kurdistan û Anatoliayê, di şert û mercên dagirkariyê de her tiştên Kurd ji xwe re birine û talankirine, Tenbûra Kurdî-Zagrosî weku gelek

tiştên din jî hatiye talan kirin. Amûra Tenbûrê gelek neteweyên derdorên Kurdistanê bikartînin ku tirk jî yek ji wan netewane û weku “Saz”ê bi nav dikin, helbet li gel pêşketina jiyan û teknolojiyê, Tenbûrê jî pêşketîtir bûye û hin guhertinên biçûk deng, qebare û tayên wê hatiye kirin.
Niha tê behskirin ku Tirk bi gelek rêyên cur bi cur hewl didin ku Tenbûra Kurdî-Mîrtayî ya zêdetirî 5000 hezar salan a Zagrosê di “UNSCO”yê de li ser navê xwe tomar bikin, tawan û talaniyeke din biqewimînin.

**Pêşniyaz**:
Em pêşniyaz dikin ji UNSCOyê re weku saziyeke navneteweyî, zanistî û rasteqîn ku lêhûrbûnên zêdetir li ser amûra Tenbûrê bike, xencî destûr nede dizîn û talaniya wê, di heman demê de weku amûreke Kurdî û Zagrosê jî bê pejirandin. Destûr nede dewleta tirkiye ku Tenbûra Kurdî-Zagrosî malmulkê xwe bike û zulmeke weha mezin û dîrokî li hember gelê Kurd, dîrok, hûner, çand, ol, fikir, hest û Tenbûra Kurdî bê kirin.
.
Lêkoler, Çandnas, zimannas û Etîmologê Kurd “Qendîl Şeyxbizînî”